EĞİTİM SEN
Eğitim ve Bilim Emekçileri Sendikası Education and Science Workers' Union

# MIROV CÎHANÊ NE WEKÎ KU XUYA YE LÊ LI GORÎ PÊŞKEŞKIRINA ZIMANÊ ZIKMAKÎ DIBÎNIN

## 21'Ê SIBATÊ ROJA ZIMANÊ ZIKMAKÎ PÎROZ BE!

Mirov, di têkiliya xwe û xwezayê de, tiştên heyî wekî ku ji wî re tê dayîn napejirîne, xwezayê bi afirîneriya xwe vediguhezîne û bi vê taybetiya xwe ji heyînên din vediqete. Kesên di nav çanda xwe de tê dinyê bi bihîstin, dîtin û hîskirinê dibe xwedî çanda ku civak bi qirnan derbasî hevdû dike. Zimanê zikmakî yê ku him çandê ava dike him jî çandê derbasî yên din dike, mala zarok e,hatta cîhana wî ye. Ji bo dema watedariya zarok ya pêşî de, nivîskar wiha dibêje "Zimanê ku jiyanê dide mirov ji ber vê sedemê bi gotina "zikmakî" tê vegotin.

Zarok di hin demên jiyana xwe de rastî derfet, bêderfetî û rêgezên çandê tê. Li hev rasthatina bi van payedarên ziman û çandê di dema avabûna qaraktera de pêk tê. Bi vê re kesên ku ber bi kamilbûyinê ve diçe ji aliyê hunerî,afirînerî, hestiyarî û bîrbirî ve jî pêş dikeve. Di heman demê de aliyên aborî,polîtîk û bîrdozî jî wekî heyînên çandê derdikeve holê. Ev heyînên şênber yên jiyanê jî bi zimanê zikmakî bûne yek. Lewma zimanê zikmakî parçekî jêneger ya jiyana civakî ye. Ji ber vê yekê jî dema qedexe li zimanê zikmakî yê kesekî dibe, ew kes şert û mercê xwebûnê jî winda dike. Perwerdehî, ji bo mirov bi awakî tenduristî bi çandê re têkîldar bibe, bi awakî afirîner bê destekirin û ji bo jiyana civakî bê amadekirin, pêvajoyeke alîkar e. Dîsa ji ber vê sedemê girîngiya perwerdehiya dê li ser gihaştin û kemilîna qaraktera mirov bandor bike û wî/wê ji pevçûn û bêaramiyê dûr bike derdikeve holê. Perwerdehî, li ser esasê pêkanîna wekhevî û edaleta civakî mafekî bingehîn e. Mafê perwerdehiyê wekî mafê din ê bingehîn, bingeha xwe tenê ji mirovbûna mirov digre. Xala 26'an a dazanîna gerdûnî ya mafê mirovan wiha dibê"Mafê perweredehiyê yê her mirovî heye. "Mafê perweredehiyê ya di belgeyên navnetewî û zagonên Tirkiyê de tê pejirandin û parastin, di asta gerdûniyê de wekî mafê mirovan tê pejirandin. Sedema vêya jî di gihaştin û pêşketina qaraktera mirov de, di

xwezanîn û xwe azadkirina mirov de bandora wê ye. Di vê çarçovê de dayîna perwerdehiyek demokratîk, cemawerî û bê cûdahî berpirsyariya devlet û hikumetan e. Ji bo mafê perwerdehiya cemawerî pêk were divê cûdahiyên ziman, ol, netew, zayend, herêmên erdnîgarî û nêrînên polîtîk ji holê bê rakirin. Lewma perwerdehiya zimanê zikmakî mafekî bingehîn e. Ji bo mafê perweredehiya zarokên zimanê wan yê zikmakî di bin desthilatdariya zimanekî din de be, divê mafê perwerdehiya bi zimanê wan bên parastin.

Zarokekî çanda ku bi rêya ziman hîn dibe û di nav de dijî û watedariya xwe bi saya zimanê xwe yê zikmakî pêş dixe, di dema destpêkirina dibistanê de tunehesibandina zimanê wî/wê zarokê/î, dê bê wateya nenaskirina nasnameya wê/wî.

Ziman ji bo pêşketina civakê hîmekî bingehîn e. Lewma perwerdehiya zimanê zikmakî ji bo çandnasîn û çandzanîna di navbera qirnan de pêwîste.

Ji ber vê Rêxistina Çand Zanîn û Perwerdehî ya Neteweyê Yekbûyî (UNESCO) di sala 1999'an de 21'ê Sibatê wekî"Roja Zimanê Zikmakî" ya navnetewî pejirand."21 Sibatê Roja Zimanê Zikmakî" cara ewilî di sala 2000 de, li her derê cîhanê ji bo piştgirîya çand û jiyana pirrengî hatiye pîroz kirin.

Bîrdoziyê netewperest, hemû rengê nav dewletê yê çandî û zimanî di nav xwe de ber bi wendabûn û tunebûnê dibe. Bi vê jî dixwaze civakek yekpare ava bike. Di vê bernameya pişaftinê de perwerdehî serî dikşîne. Di civakên ku jiyan û perwerdehiya yek zimanî desthilatdar be tê xwestin ku zimanê dewletê yê fermî, di jiyana rojane û perwerdehiyê de di meriyetê de be. Devjêberdana zimanê gelên din û hînbûna hemû zarokan ya zimanê fermî tê pêkanîn. Zarokên ku ji xêncî zimanê zikmakî hînî zimanekî din dibin, zimanê wê/wî yê yekemîn di mejiyê wî/wê de tê qelskirin. Ev bîrdoziya yekzimanî di perwerdehiyê de "qelskirinê" û "hindikhiştinê"dike pratîkê.

Bandora neyînî ya li ser aramiya civakê di lêkolîn û xebatên di zimanzanî, antropolojî û zanînê perwerdehiyê dederdikeve pê. Modelên qelskirina zimên ya di perwerdehiyê de û li gorî van lêkolîna perwerdehiya bingeha xwe ji bîrdoziya yekrengî digre, bi armanca pişaftinê tevdigere. Û bandora xwe ya neyînî li ser derûnî, zanîn û perwerdehiyê çêdike. Lewra xisarên aborî, ramyarî û tenduristî çêdibin.

Di cîhanê de perwerdehiyên ne pirzimanî astengiyên derûnî, pedagojîk û zimanî li ser pêvajoya perwerdehiyê çê dike. Tunebûna zimanan, windabûna pirengiya zimanan, astengiyên li ser pêşketina zarokan ji çend neyiniyên modela yek zimanî ye.

Li Tirkiyê tu dev ji perwerdeheya zimanê zikmakî berde, hebûna zimanê cûda jî nedihat pejirandin û nayê pejirandin. Heya niha jî zimanê ji bilî yê fermî mîna "Zimanê tune" an jî " Zimanê nayê zanîn "tê bilêvkirin.

Kurdî, Erebî, Çerkezî û Lazî bi polîtîqayên pişaftinê re rû bi rû mane. Îro bi mîlyonan xwendekar ji perwerdehiya bi zimanê zikmakî bêpar tê hiştin. Xebatên zanistî dide zanîn ku zarokên zimanê wan di bin polîtîqayên qelskirinê bimîne, asta wan ya perwerdehiyê jî qels dimîne.

Ji sedemên vê rewşê yek jî pirsgirêkên hevnefahmkirina  mamoste û xwendekaran e. Zarokên ku zimanê gelê wan tên çewisandin, dema dest bi dibistanê dikin dikevin nav cîhaneke xerîbê wan. Ev zarokna li wê cîhana xerîbê wan e, dibe kêm fêhmdar û ji kaniya zimanê xwe jî dûr dikeve.

Di pergala perwerdehiyê ya ku zimanê wê nizane de pêşketinê pedagojîk li alîkî heta Tirkîyek rojane hîn bibe divê çend salan di nav vê pêvajoyê de bimînin. Ev rewş jî ji bo zarokên ku bi zimanê zikmakî perwerdehiyê nabîne li gorî zarokên zimanê wan yê zikmakî Tirkî ye rewşek dezavantajî derdixîne pêş.

Ji bo sekeftinek akademîk di navbera wan de cûdahiyek bi salan çê dibe. Her wiha derengketina xwendin û nivîsandinê serkeftinên akademîk yê derengmayî , pol dubarekirin û dibistan terikandin jî encamên vê rêbazê ne. Ev jî xwegihaştina mafê perweredehiyê asteng dike.

Ji aliyê din ve bi lêkolînan jî hatiye peyitandin ku dibistanên ku bi zimanê zikmakî perwerdeyê didin serkeftina wan zêdetir e.  Li Afrika, Asya, Ewropa, Amerîkaya Bakur û Başûr li gelek welatên cîhanê mînakên serkeftina di perwerdeya pirzimanî de hene. Ji ber vê jî divê her zarok di cîhaneke ku karibe zimanê xwe yê zikmakî pêşda bixe û bi zimanê xwe yê zikmakî jiyana xwe bijî bigihê. Bi armanca gihandina perwedeya bi zimanê zikmakî, perwerdeya pirzimanî pirek e di navbera çand û zimanan de. Ev demokrasî û wekheviyê

pêşde dixe û gelên cuda cuda û kêmderfet diparêze. Ev ji bo gihandina jiyanek û cîhanek ku edaleta civakî lê saz bibe gavek e. Ji bo ku kes pêşde bikevin hewcedarî ji civakeke wisa azad û li ser wekheviya gelan, wekheviya zimanan û çandan pêşda bikeve heye . Di vî warî de li ser gihandina perwerdeya bi zimanê zikmakî, perwerdeya pirzimanî xalek gelek girîng e. Ji bo civakeke pirçandî û demokratîk, divê polîtîkayên perwerdeyê yên ku li ser " ewlekariya perwerdeyê" hatine avakirin bêne terikandin. Divê dev ji bisînorkirina zimanên din bê berdan. Divê civakeke wisa bê avakirin ku her kes bikaribe zimanê xwe yê zikmakî hîn bibe û bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdeyê bibîne.

Weke Egitim Sen em 21'ê Sibatê Roja Zimanê Zikmakî ya Cîhanê li hemû cîhanê û hemû gelên li Tirkiyeyê pîroz dikin. Em daxwaz dikin ku hemû astengiyên fermî û astengiyên kiryarî yên li ber pêşketin û pêşdexistina hemû zimanên din yên zikmakî demildest bêne rakirin.